

#YekmalPiştgiyariyaWeDike

#PerwerdehiyaMalbatîDigelKoronayê



Malbatên Rêzdar,

Bi vê nûçenamê, em dixwazin hinek agahî û

pêşniyaran bi we re parve bikin ji bo jiyana we ya rojanê di nav malbatê de û gazî we dikin beşdariyê.

Werin em bi hev re vê demê li pişt xwe bihêlin!



Gotinên Rojê

"Ez kêfxweş im ku dibistan tune. Li malê jiyana xweş e! Ez bi dilê xwe xwarin dixwim û boyaxê çêdikim. Xwîşk û birayên min carna min aciz dikin. Lê ez kêfxweş im ku ew tendûrist in."

- M., 12 salî.



Pêşniyarên rojane

1. Li gel zaroka/ê xwe bernameya rojê çêkin li ser kaxizeke mezin û li diwarê daleqînin.
2. Di bernameya rojê de danên xwarin û razanê diyar bikin.
3. Demeke sînorkirî veqetînin ji bo bikaranîna medyayê.
0-3 salî: çiqas kêr ewqas baş
3-5 salî: herî zêde rojê nîv saet (30 deqqe)
6-9 salî: rojê saetek
ji 10 salî mezintir: ji bo her sala emrê wan, saetek nav hefteyekê de
4. Rojê herî kêr 1-2 saet li derve hewayê paqij de wext derbas bikin
5. Derfetê bidin zarokên xwe ji bo ku ew bixwe bikarin biafirînin û afirîner bibin:
www.youtube.com/playlist?list=PLLHb3G-bNo2exHHi4C-FcKIYbD_shwul1
6. Her roj herî kêr carekê ji zaroka/ê xwe re bêjin ku hûn bi wan dilxweş in Nimûne:
Bi te re wext derbaskirin gelek xweş e.
Tu xweyî cihekî taybet î di vê malbatê de.
Ez hêvî dikim îro roja te gelek xweş derbas bibe.
Ez gelek hez dikim te temaşe bikim wexta tu ...
(tiştê ku zaroka/ê we bi çêkirina wî taybetî hez dike.)

#YekmalPiştgiriyaWeDike

#PerwerdehiyaMalbatîDigelKoronayê



Gotinên Rojê

„Ez bîrya dibistanê dikim, ez bîrya xwendekaran dikim. Ez bi xwe ji koronayê natirsim, lê belê hevalên min ditirsin. Ji ber vê yekê, ez pirî caran di odeyê de me. Ez û bavê xwe gelek caran derdikevin derve û hingê ji destê me tê, jiyaneke normal derbas dikin.“
- M., 11 salî.



**Dê û bavên hêja,
Niha dema we ye...**

**Werin em maskeyên xwe yên ji bo parastinê
bi xwe çêkin.**



Hûn dikarin li vê lînkê binêrin...
www.naehtalente.de/atenschutz-naehen/

Gavên şikl û dûrinê bar bikin, derxin û êdî amade ye.

**Hûn dikarin resmê maskeyên xwe bigirin û li ser rûpela
me ya Facebookê parve bikin:**

www.facebook.com/yekmal.de

#YekmalPiştgiriyaWeDike

#PerwerdehiyaMalbatîDigelKoronayê



**Pirsên we hene?
Hûn dikarin bi riya telefonê
an jî înternetê xwe bigihînin me!**



**Ji bo bavan
0176 200 38 915 / Ajo**



**Ji bo dayikan
0176 307 50 705 / Payman**



**Şêwirmendiya malbat û perwerdehiyê
Sêşem / 13.00 - 15.00 Uhr
030 61625848 / Günay û Cornelia**



**Me li ser Facebookê bişopînin
www.facebook.com/yekmal.de**



**Me li ser malpera me bişopînin
www.yekmal.de**